Şerê ezîtî û kesebaziyê pêdivî ye

Memê alan

Ez naxwazim di vê mijarê de gotinên qelew û aloz bi kar bînim , an jî di dor giran re bizîvirim û xwedevanan sergêjî bikim . Ji dêvla wê , ez hêvî dikim ku kanibim bi çend şor û peyvên hindik - rindik , hêsan û yekser armanca mijara xwe bighînim xwendevanan û ji wan re , pîsîtî û xirabiya van xeysetan şirove bikim .

Her mirovek , ji zikmakiyê de , hemî riweştên rindî , nerindî, başî û xirabî , rastgo û vir …… H.W.D . pê re peyda dibin , lê vemirî û di xew de ne . Hino hino li gorî şêweya perwerdekirina wî , hin ji wan xeysetan gur û geş dibin û hin ji wan jî, weke xwe dimînin . vêca her mirovek li gorî xeysetên ku tê de geşdibin, an wê qencî û rindiyê bike yan jî, wê bi pîsîtî û xirabiyê de biçe.

Ev herdu xeysetên ku bûne navnîşana mijara me , ji hemî riweştên nebaş , pîstir û genîtirin û bi hev ve girêdayî ne . Ne tenê weha , hê bi xwe re tiştine din jî, nebaş di mirov de vedijînin . Mîna : vir û vûtan , qelzandin , dizî , propegandayên nebaş ……..

Çima em wiha dibêjin ? Ji ber ku , mirovê ezezî û keysebaz ji xwe hez e. Yanê berjewendiya wî ya taybet, di ser berjewenda tevan re ye . Ta ku armanca xwe bibe serî , wê hemî şêweyên çewt , xirab û nizim bide ber xwe , nirx û encama wê çi dibe jî bila bibe .

Gelo, eger em hinekî rûpelên dîroka tevgera Kurd li Sûriyê biqulibînin, hûrik hûrik di sedemên perçebûna wê de , mijûl bibin , ewa ku niha li pêş me bûye asteng û aloziyek mezin û hiştî em jar bimînin , baweriya gelê me bi me ne pihêt be û em nizanin bi çi rengî û kîngê bi ser hev wînin . Ma ne berê û ta niha û siba jî, sersedem serekîn ezîtî û kesebaziya hin kesan, di rêbertiya partiyên Tevgera Kurdî de ye . Ji ber ku, kesayetî û berjewenda wan di ser her tiştî re ye , dema ku ezeziya wan bi sernekeve neqencî û karên nebaş dikin .

De ka , Kurdperwerên bi rûmet , em bi hev re , serê van xeyset û riweştan bikin , hîn di dergûşê de em bifetisînin û nehêlibin geşbibin , ta ku kurdayetiya gelê me bi serkeve .

****

Jiyan Helwest e

Dêrsim Alî

Li dora sala 1924 an, gava şer li dijî Firensiyan li Çiyayê Kurmênc rawestî, leşkerên Firansa derbas navça çiyê bûn. Li dervey gundê Qêsim, gundê Seydê Dîkê, rêberekî berxwedanvavên Kurd bû, leşkerên Firensî avêtin segê Seydê Dîkê û kuştin. Xeber gihîşte Seydo axa. Serleşkerê yekser derbas mala Axê bû, li nava hewşê rawestî, lê Seydo axa derneket bixêrhatina wî. Pişt re gava rê nedît derket lê bi rûyekî tirş. Serleşker pirsî çima axe derneket pêşwaziya wî.? Wergêr jê re got ku ew li ser seg xeydiye. Serleşker got: Bihayê segê wî çi ye ez bidimê. Seydê lê vegeran got: Segê min wan leşkerên te tevan dike. Ji bona xatirê xudanê malê mera keviran navê segê wê. Wergêr tirsî ew bersiv wernegerand, lê serleşker lê zor kir ku hewalde, got: Dibêje xwîna segê min leşkerên te tevan dike. Hîngê serleşker serê xwe hejand û ew berve axê çû.